



Bi serperiştîya serokê Zanîngeha Silêmanîyê

Birêz Prof. Dr. Kosar Mihemed Elî Murad

Bi serokatîya dekanê Fakulteya Zanistên Îslamî ya
Zanîngeha Silêmanîyê

Birêz Doç. Dr. Xalid Ehmed Mistefa û

Serokê Beşa Ziman û Edebîyata Kurdî ya Zanîngeha
Dîcleyê

Birêz Doç. Dr. Zülküf Ergün

Fakulteya Zanistên Îslamî bi hevbeşîya Komeleya
Nûbiharê – Dîyarbekir – Turkiye konferensa heftem a
zanistî ya navneteweyî di bin vî navî da li dar dixê:

PERGAŁA MIROV Û GERDÛNÊ DI HIZIRA BEDÎUZE- MAN SEÎD NÛRSÎ DA

Di bin diruşma:

Rehendên Şaristanîyê ji bo
Damezirandina Aştîya Civakî
û Bicihkirina Nasnameya
Çandî

Bi piştevaniya Xwedê dê li Zanîngeha Silêmanîyê di
dema **18-19/4/2027** da bê lidarxistin.

PÊŞKÎYA KONFERANSÊ

Pesn û sipas ji bo Xwedayê perwerdekarê cihanê, dirûd û silav li ser giyanê pak ê Pêxemberê me yê serwer Mihemedî û li ser malbat û hevalên wî bin.

Cihana me ya îro di nav guherînên bilez ên hizirî, çandî û civakî ra derbaz dibe ku hin meydanxwazîyan kûr rûbirûyê wê bûne û karîgerîya wan li ser pergala nîrxên mirovî çê dibe û şax davêje ser seqamgîrîya civakî û nasnameyên wan ên resen.

Ji vî aliyê ve ji bo rûbirûbûna meydanxwazîyan pêwîstîyeke lezgîn derdikeve holê, bi sûdwergirtina wan nêrînên şaristanî ku komkerên resen û nûxwazîyê ne û avakerê çanda aştî û pêkve jîyanê ne û li rêz li pirrengîyê digirin.

Bi vî nêrînê, fikra nûxwaz a pêşewa Bedîuzeman Seîd Nûrsî wek projeyeke gîştîgar a çaksazîyê, kar dike ji bo dubare avakirina peywendîyên diyalektîkî di navbera mirov, gerdûn û afirîner da bi rêya nêrîneke Qurani ku îmanê dike bingeha şaristanîyê, zanîne dike rêya pêşketinê û exlaqî jî dike payeya aştîya civakî.

Li ser binemaya vî rehenda epîstemolojîk, Fakulteya Zanistên Îslamî li Zanîngeha Silêmanîyê bi hevbeşîya Komeleya Nûbiharê ya Dîyarbekirê bi navnîşana jêrîn konferansa heftem a zanistî ya navneteweyî li dar dixê:

Pergala Mirov û Gerdûnê di Hizira Bedîuzeman Seîd Nûrsî da: Rehendên Şaristanîyê ji bo Damezirandina Aştîya Civakî û Bicihkirina Nasnameya Çandî

Ev konferans wek platformeke akademîk a astbilind kar dike ji bo komkirina desteyeke bijartî ya vekoler û bîrmendan ji bo vekolîna rehendên giring ên vî projeya çaksazîyê û ronîkirina rengvedana dîrokî û rastîya vî navçeya pirçand, bi taybetî li Kurdistan û navçeyê, ku hertim jîngeheke zindî bûne ji bo van cure berhemên hizirî û ronakbîrîyê.

Bi rêya vî hevdiîtinê em bi kelecana li benda nîşandana rola mezin a kesayetîya Nûrsî ne di avakirina mirovê hişyar û bicihkirina nîrxên dadperwerî û pêkve jîyana hevbeş, di gel vekirina asoyên lihevanîna zanistên şerî û mirovî. Ev jî wek cextkirin e li ser wê yekê ku hizira resen a îslamî roleke zindî û karîger dibîne di çekirina paşerojeke aramtir û geştir da.

VÎZYONA KONFERANSÊ

Ev konferans hewl dide fikra Bedîuzeman Seîd Nûrsî wek projeyekî şaristanî ya temamker bixwîne, ku şîyana wê ya beşdarîkirinê di avakirina mirovê hişyar ê hevçerx da heye, bi rêya hevsengkirina peywendîya navbera mirov û gerdûn û wergirtina îlhamê ji nîrxên ruhî û epîtemîk li hember astengên fikrî û jîngehî û civakî yê nîha.

PEYAMA KONFERANSÊ

Amadekirina zemîneke zanistî ya temam ji bo gotûbêj û rexne û şîrovekarîyê, bi mebesta dubare anîna hizirên Nûrsî ji bo meydana vekolînê akademîk ên hevçerx, bi awayekî ku di navbera kelepore û nîrxên mirovî yê cihanî da lihevanîne pêk bîne, di heman demê da çareserîyeke realist pêşkêş bike ji bo bihêzkirina nîrxên aştîya

civakî û parastina nasname û hestkirina bi berpirsîyarî mirovî li hember gerdûn, siruşt û civakê.

ARMANCÊN KONFERANSÊ

1. Ronkarîna hevtemamkirina her du têgehên mirov û gerdûnê di Rîsaleyên Nûr da û rola dariştina nêrîneke gerdûnî ya tewhîdî ya gîştîgar.
2. Pêşkêşkirina projeyên fikrî yê Nûrsî wek mînakeke şaristanî, ku xwedî amrazên epîstemîk e ji bo derbazkirina qeyranên hebûnî û têkçûna nîrxên mirovê hevçerx.
3. Destnîşankirina mekanîzmên teorîk û pratîk ên hizirî yê Nûrsî, bi mebesta xurtkirina pêkve jîyana aştîyane û derxistina rola karê baş û erênî di rêgirîya mîlmîlaneyan û dabînkirina îstîqrara civakî da.
4. Derxistina karîgerîya projeya şaristanî ya Nûrsî di parastina nasnameya kurdî û çandî, û îmanî da li hember bizavên cîhangîrî, regezperestî û rojavayîbûnê, di gel cextkirina li ser nîrxên gotûbêj û vekirîbûna li hember hevbeşîyên mirovî da.
5. Amadekirina derfetên nû ji bo vekolînê zanistî di fakulteyên îslamî da bi mebesta girêdana deqên şerî û realîteya civakî û gerdûnî, bi rêya sûdwergirtina ji azmûna mamosta Bedîuzeman Seîd Nûrsî.
6. Ronîkirina rêbaza Nûrsî li ser parastina jîngehê û vegeandina hevsengîya gerdûnî wek beşek ji berpirsîyarîya exlaqî û şaristanî ya mirovî.

TEMAYÊN KONFERANSÊ

Temaya yekem: Nêrîna gerdûnî û hebûnî di hizira Nûrsî da

-Dîyalektîka afirîner, gerdûn û mirovî di Rîsaleyên Nûr da
-Paqijkirina derûnî û avakirina kesayetîya mirovê hevseng
-Gerdûn wek kitêbeke vekirî û karîgerîya wê li ser bicihkirina bawerîyê
-Cihê mirov di hebûnê da: Ji mezaxtinê ber bi xelîfetî û berpirsîyarîyê.
-Karîgerîya tefekura li gerdûnê li ser zîzkirina derûna mirovî.

Temaya Duyem: Rehendên Şaristanî û Aştîya Civakî di Projeya Nûrsî da

-Têgeha şaristanî û medenîyetê di Rîsaleyên Nûr da
-Avakirina mirovê ronakger wek binemayek ji bo hişyarkirina umetê
-Rêbaza karê erênî û karîgerîya wê di bicihkirina aştîyê di civakên pirçand da
-Azadkirina hişmendîya musulmanan û hilweşandina gotara postkolonyalîzmê

-Rexnegirtin li hizira tundajotîyê û bihêzkirina nermajotîyê

-Etîka gotûbêjê di gel yê din (dînî, mezhebî û çandî)

-Berevanîkirina pêkhatayên civakî û pêkve jîyana navbera pêkhatayan li Kurdistanê

Temaya Sêyem: Nasnameya Çandî û Îmanî li cem Nûrsî

-Bingehên nasnameya îmanî di Rîsaleyên Nûr da.

-Rengvedana nasnameya kurdûnê di jîyan û hizira Seîdê Berê da

-Projeya Medreseya Zehrayê: Lihevanîna zanistên modern û dînî wek derîyek ji bo çaksazîya epîstemîk li Kurdistan û navçeyê

-Rola Rîsaleyên Nûr di parastina ziman, nîrx û exlaqê civaka kurdî da

-Rola Nûrsî di hevsengkirina navbera taybetmendîyên çandî yê kurdî û şaristanî da

-Parastina nasnameya îmanî û çandî li hember pêlên rojavayîbûnê û vekirîbûna bêkontrol da

Temaya Çarem: Felsefeya Siruşt û Hişyarîya Jîngeyî di Rîsaleyên Nûr da
-Nêrîna şer'î û şaristanî ji bo parastina siruşt û rûbirûbûna qeyranên keşûhewayê

-Teyîsîna navê pîroz ê "el-Qudus" di pergala gerdûnê da û kêşeya pîsbûna jîngehê

-Rexnegirtina zêderewiyê û diyardeya mezaxtinê wek derwazeyek ji bo çareserkirina qeyrana jîngeha cihanî

-Diyalektîka peywendîya navbera mirov û jîngehê, ji heza xweferzkirinê heta felsefeya emanet û xelîfetiyê

-Îlhamwergirtina fikra jîngehî di tefekura Nûrsî da ji bo siruşt çiyayî ya Kurdistanê û girêdana nasnameyê bi cihî ve

Temaya Pêncem: Mafên Mirov û Malbatê di Projeya Nûrsî da

-Maf û rûmet di Rîsaleyên Nûr da

-Parastina malbatê di civaka kurdî da bi rêya rênîşanderîya perwerdeyî û elxaqî yê projeya Nûrsî

-Avakirina nîrxan û parêzbendkirina civakî ya jinê ji bo rûbirûbûna rojavayîkirinê

-Mekanîzmayên rûbirûbûna hilweşandina malbatê û herifîna nîrxan di civakê da

-Jin û malbat wek hêlîna nasnameyê û aştiya civakî di projeya Nûrsî da

Temaya Şeşem: Xwendina Hevçerx û Asoyên Paşerojê di Çaksazîya Nûrsî da

-Jîrîya ruhî di rûbirûbûna madegerayîya zêderew û hişê çekirî da

-Bikarxistin û karkirina hizira Nûrsî di pergala perwerdehiyê û bernamêyên xwendinê da

-Berawirdkirin û pêdaçûna destnivîsên resen ên Rîsaleyên Nûr

-Qenaeta yê din ji bo projeya hizirî ya Nûrsî

MERCÊN BEŞDARÎKIRINÊ

1. Divê vekolîn di çarçoveya temayên diyarkirî da bin
2. Vekoler divê pabendî binemayên vekolînên zanistî bin ji aliyê binyatdanîn, wergirtina serçavîyan û şirovekirinê ve.
3. Pêwîst e vekolîn taybetmendiyên resenî, metodnasî û nûgeriyê di mijar û armancê da li xwe bigirin di gel raçavkirina dirustîya ziman û hûrîya şewaza dariştinê
4. Divê vekolîn berê nehatibe weşandin yan belavkirin û di tu konferansêkê da berê nehatibe pêşkêşkirin. Herweha nabe vekolîn ji nameyên zanistî yê mastir û doktorayê yan ji kitêbeke weşandî hatibin wergirtin.
5. Pêwîst e navnîşana vekolînê, kurteya wê û bêjeyên sereke bi her sê zimanên kurdî, erebî û îngilîzî bînin nivîsin.
6. Pêwîst e hejmara rûpelên vekolînê di navbera 20-25 rûpelan da be, tevî jêrenot, çavkanî û jêderan ve.
7. Pêwîst e vekolîn bi awayê Microsoft Wordê bê pêşkêşkirin, ji bo zimanê kurdî û erebî bi keybordeke Unicode, bi fonta Noto Naskh Arabic bi puntoya 12ê û ji bo zimanê îngilîzî ji bi fonta Times New Romanê be
8. Pêwîst e pergala Harvardê di sistema referansan da wek serçavî bê bikaranîn.
9. Vekolîn ji bo vê navnîşana elektorîk tê şandin: sul.conf.2027@gmail.com
10. Vekolîn bi zimanên kurdî, tirkî, erebî, îngilîzî tînin wergirtin.

11. Vekolînên ku hatine wergirtin di kovareke zanistî ya resen li Zanîngeha Silêmaniyê tînin weşandin.

12. Beşdariya konferansê bêberamber e.

LIJNEYA NAVENDÎ

1. Doç. Dr. Xalid Ehmed Mistefa: Dekanê Fakultea Zanîstên Îslamî (Serok)
2. Doç. Dr. Zülküf Ergün: Serokê Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî ya Zanîngeha Dicleyê
3. Prof. Dr. Osman Aslanoglu: Serokê Komeleya Nûbiharê
4. Prof. Dr. Şemal Ebdul Mihemed: Arîkarê Dekan
5. Prof. Dr. Îsmail Mihemed Celal: Serokê Beşa Perwerdeya Dînî
6. Doç. Dr. Aras Hemeemîn Usman: Serokê Beşa Şerîetê (Biryarderê Lijneyê)
7. Doç. Dr. Zana Mihemed Emîn Seîd: Serokê Beşa Xwendina Îslamî
8. Doç. Dr. Aso Reza Ehmed: Serokê Beşa Binemayên Dînî

LIJNEYA ZANISTÎ

1. Prof. Dr. Bextyar Necmedîn Şemsedîn...Zanîngeha Silêmaniyê (Serok)
2. Prof. Dr. Serdar Reşîd Heme Salih...Zanîngeha Silêmaniyê (Biryarderê Lijneyê)
3. Prof. Dr. Mihemed Ebdulla Ehmed...Zanîngeha Silêmaniyê
4. Prof. Dr. Kameran Ewrehman Mecîd...Zanîngeha Silêmaniyê
5. Prof. Dr. Husên Mihemed Îbrahîm...Zanîngeha Silêmaniyê
6. Prof. Dr. Usman Mihemed Seîdalla...Zanîngeha Silêmaniyê
7. Prof. Dr. Fazil Mehmûd Qadir...Zanîngeha Silêmaniyê
8. Prof. Dr. Ziya Hebib Tofig...Zanîngeha Silêmaniyê
9. Prof. Dr. Ebdulla Mihemed Kerîm...Zanîngeha Silêmaniyê
10. Prof. Dr. Îrfan Reşîd Şerîf...Zanîngeha Silêmaniyê
11. Prof. Dr. Mûcahid Bilici...Zanîngeha New Yorkê (Amerîka)
12. Prof. Dr. Abdurrahman Adak...Zanîngeha Mardîn Artukluyê (Türkiye)
13. Prof. Dr. Hayrullah Acar...Zanîngeha Mardîn Artukluyê (Türkiye)
14. Prof. Dr. Mehmet Zahir Ertekin...Zanîngeha Mardîn Artukluyê (Türkiye)
15. Prof. Dr. Abdulhadi Timurtaş...Zanîngeha Van Yüziüncü Yılê (Türkiye)
16. Prof. Dr. Hasan Tanrıverdi...Zanîngeha Dicleyê (Türkiye)
17. Prof. Dr. Ahmet Erkol...Zanîngeha Mardîn Artukluyê (Türkiye)
18. Prof. Dr. Mehmet Bilen...Zanîngeha Dicleyê (Türkiye)
19. Prof. Dr. Metin Bozan...Zanîngeha Dicleyê (Türkiye)
20. Prof. Dr. Mustafa Öncü...Zanîngeha Mersinê (Türkiye)
21. Prof. Dr. Serdar Şengül...Zanîngeha Kirsehirê ya Ahî Evranê (Türkiye)
22. Prof. Dr. Abdurrahim Alkış...Zanîngeha Şirnexê (Türkiye)
23. Prof. Dr. Nurettin Beltekin...Zanîngeha Mardîn Artukluyê (Türkiye)
24. Prof. Dr. Taha Nas...Zanîngeha Mardîn Artukluyê (Türkiye)
25. Prof. Dr. Akif Akto...Zanîngeha Mardîn Artukluyê (Türkiye)
26. Prof. Dr. Nesim Sönmez...Zanîngeha Van Yüziüncü Yılê (Türkiye)
27. Prof. Dr. Bayram Kanarya...Zanîngeha Van Yüziüncü Yılê (Türkiye)
28. Prof. Dr. Husên Ebdulhadî...Vekolerê serbixwe (Şahnîşîna Siûdiyeyê)
29. Prof. Dr. Mehmet Gürses...Zanîngeha Floridayê (Amerîka)
30. Prof. Dr. Mehmet Asutay...Zanîngeha Durhamê (İngiltere)
31. Prof. Dr. Ehmed Ewad...Vekolerê serbixwe (Lubnan)
32. Prof. Dr. Ebdulrehman Xetib...Zanîngeha Qeterê (Qeter)
33. Prof. Dr. Deniz Çiftçi...Zanîngeha Cambridge (İngiltere)
34. Doç. Dr. Umîd Usman Ehmed...Zanîngeha Silêmaniyê
35. Doç. Dr. Abid Ehmed Pişderî...Zanîngeha Silêmaniyê
36. Doç. Dr. Mihemed Ebdulrehman Mihemed...Zanîngeha Ezherê (Misir)
37. Doç. Dr. Ebdulrezaq Ehmed Mihemed...Zanîngeha Ezherê (Misir)

38. Dr. Celal Celalizade...Zanîngeha Tehranê (Îran)

39. Dr. Suheyl Sepan...Zanîngeha Qeterê (Qeter)

40. Mamostayê arîkar Xallan Celil Rustem...Kovara Zanîngeha Silêmaniyê

LIJNEYA AMADEKARÎYÊ

1. Doç. Dr. Umêd Mihmed Necme (Serok)
2. Doç. Dr. Saman Wehab Emîn (Biryarderê Lijneyê)
3. Prof. Dr. Nasih Fetah Nesrulla
4. Doç. Dr. Sebah Resûl Mehmed
5. Doç. Dr. Hawkar Ebdulrehman Seîd
6. Doç. Dr. Peyam Cafir Elî
7. Dr. Ebdulla Qurbanî Kerem
8. Mamosta Rêzan Mihemed Elî
9. Mamosta Rêbwar Ehmed Salih
10. Mamosta Rêbîn Ebdulwehab Cemîl
11. Mamosta Serhed Ehmed Selîm
12. Mamostayê arîkar Mistefa Mihemed Ebdulla

LIJNEYA PEYWENDÎ Û PÊŞWAZÎYÊ

1. Prof. Dr. Mehmûd Ebdulla Mehmûd (Serok)
2. Prof. Dr. Mihemed Husên Ebdulla (Biryarderê Lijneyê)
3. Prof. Dr. Ekrem Bayîz Mihemed
4. Doç. Dr. Sebah Setar Seîd
5. Dr. Serbest Nadir Ebdul
6. Dr. Sirwe Ebduletîf Mecîd
7. Dr. Kejal Mihemed Emîn Seîd

LIJNEYA RAGIHANDINÊ

1. Prof. Dr. Mehdî Qadir Ehmed (Serok)
2. Mamosta Aram Elî Mecîd (Biryarderê Lijneyê)
3. Dr. Sertîb Ezîz Fars
4. Dr. Celal Cemal Xefar
5. M. M. Karwan Elî Ehmed
6. Kardo Mehmûd Hesen
7. Diye Burhan Salih

DEMÊN GIRING ÊN KONFERANSÊ

1. Dema dawî ji bo şandina kurteyan di gel jîyannameya kesî: 15. 11. 2026
2. Dema ragihandina kurteyên wergirtî: 1. 12. 2026
3. Dema dawî ji bo şandina vekolînê: 15. 2. 2027
4. Dema pêkanîna konferansê: 18-19. 4. 2027

PEYWENDÎ

Prof. Dr. Bextyar Necmedîn Şemsedîn
(Serokê Lijneya Zanistî)
+9647701924631

Prof. Dr. Serdar Reşîd Heme Salih
(Biryarderê Lijneyê)
+9647866988606
sul.conf.2027@gmail.com